BERG

Kêf û lîstikên vê havînê Li rûpel 2 binêrin

3 Pêşanên ŞAS ên ser rê yên sîteyan şûnve tên

5 Tev li Koma Şêwirdarîyê ya Xwedî-lease'an bibin

8 Rojeke derve ya malbatê qezenc bikin

RÛPEL 2

Kêf û lîstikên vê havînê li gel Hackney Homes
Yekşem 24 Tebax, 12.30 – 17.30
Haggerston Park, E2 8NH
Yekşem 2í Tebax, 12.30 – 17.30
Mabley Green, E9 5RJ

Nuha ku hewa germ dibe, Hackney Homes careke din mazûvanîya çalakîyên ji bo hemû nişteçîhan dike ku werin derve û hinek kêf bikin.

Wek sala çûyî, em ê du çalakîyên mezin li dar bixin – yekemîn roja Yekşem 24 Tebax li Haggerston Park, E2 8NH û duyemîn Yekşem 28 Tebax li Mabley Green, E9 5RJ.

Nişteçîhên hemû jî û temenan kanin bi malbat, heval û cîranên xwe re werin rojeke derve. Dê ji bo her kesî tiştek hebe; çalakîyên zarokan, dahnên sporê ji alîyê mamosteyên sporê yên perwerdebûyî, şêwirdarîya kardîtin û derfetên perwerdeya kar û şabûn.

Îsal em tev li Tîma Parkan a Şaredarîya Hackney û Tîma 2012an bûn, ew ê amade bin ku hemû pirsên we yên li ser hemû mijarên Olîmpîkan bersiv bikin û her weha bikin ku hun çend sporên Olîmpîkê biceribînin, wek: çengkirina dirêj, tenîsa masê û heta dibe ku basketbola kursîya bi teker.

Ji bo bêtir agahîya li ser çalakîyên havînê, têkilî çêkin li gel Tîma Komunîkasyonan li 020 8356 2066 an jî email bişînin
housingeditor@hackneyhomes.org.uk

RÛPEL 3

Pê re nejîn, rapor bikin

Pêşanên ser rê yên şêlên antîsosyal (**ŞAS**) tên sîteyeke nêzîkî we

Vê havînê, pêşanên rê yên Hackney Homes li gel vê mesajê diçin

hejmarek sîteyan – pê re nejîn, wê rapor bikin!

Hun kanin werin û bi karmendan re li ser mijarên li sîteyê yan li herêmên derdorê nehênî bipeyivin. Em ê bi we re bipeyivin ku ji bo çareserkirina wê em ê çi gavan bavêjin.

Hun her weha kanin karmendên Tîma Taxên Ewletir û Polîsê herêma xwe bibînin û bi karmendên Tîma Ewlehîya Civakî ya Hackney re bipeyivin.

Heke kûçikekî we hebe, hun kanin li ser ku çawa bibin xwedî kûçikekî berpirs şêwirdarîyê û li ser derzîkirinên erzan, xadimkirin, tedawîya sipî û kurman agahîyê bistînin. Bi ser de, em kanin li ser acizîya dengzarîyê û ku ji bo alîkarîyê bi ku ve biçin, şêwirdarîyê pêşkêş bikin.

Ji bo bêtir agahîya li ser pêşanên ser rê, li gel Tîma Komunîkasyonan li **020 8356 2066** têkilî çêkin, an jî email bişînin: housingeditor@hackneyhomes.org.uk

Tarîxên pêşanên ser rê li jêr in:

Cîh	Demên bûyerê	Tarîxa pêşana rê
Frampton Park Estate (hemberî 92 Well Street), E9 7JA	13.30 – 16.00	Çarşem 20 Tîrmeh
Bannister Estate, Homerton High Road, E9 6BH	13.30 – 16.00	Pêncşem 28 Tîrmeh
Scriven Court Estate (li meydanê). Ji Queensbridge Road, E8 4LD	12 – 14.00	Duşem 1 Tebax
Warburton and Darcy Estate, Nêzîkî Broadway Market, E8 3RS	13.30 – 16.00	Pêncşem 18 Tebax
Gillett Square, Dalston, N16 8AZ	15.00 – 17.00	Şemî 3 Îlon
Kings Crescent, hemberî Clissold Park, N4 2XN	12 – 14.00	Şemî 17 Îlon
Trelawney Estate, hemberî Tesco li Mare Street, E9 6NS	15.00 – 17.00	Çarşem 21 Îlon
Colville Estate, nêzîkî Britannia Leisure Centre, N1 5PR	12 – 14.00	Duşem 3 Cotmeh

Hun kanin bi karmendan re li ser hemû mijarên li sîteyê yan derdora wê nehênî bipeyivin.

RÛPEL 4

Vê havînê dayina kirêya xwe bixin jorê lîsteyê

Roj heye, germ e û em gişt bi havînê kêf dikin. Tiştekî ku divê li jorê lîsteya we ya havînî be, dayina kirêya we ye. Hun li malê bin yan li betlanê bin, we zanîbû ku Dîrekt Debît rêya herî hêsan a dayina kirê ye? Hun kanin telefonî **020 8356 2162** bikin, an jî formeke serîlêdanê ji websîteya Hackney Homes www.hackneyhomes.org.uk daxin, da ku xwe qeyd bikin.

Ji bo nûnerê xwe yê Desteya Birêvebir a Hackney Homes deng bidin

Heke hun li De Beauvoir û Queensbridge, Bakurê Rojhilat û Shoreditch rûdinin, hun ê di demeke kin de pakêteke deng dayina ji bo nûnerê herêma xwe yê Desteya Birêvebir a Hackney Homes bisitînin.

Divê hun daxuyanîya her namzedekî bixwînin, bi formê ji bo kesê tercîhkirî deng bidin û bi zarfa dayî şûnve bişînin.

Divê hun wê berî 29 Tîrmeh 2011an ji me re bişînin.

Ji bo bêtir agahîyê, li gel Hackney Homes Governance Team li **020 8356 3432** an jî email tess.merrett@hackneyhomes.org.uk têkilî çêkin.

Xanîyên Minasib dest pê dikin

Nişstecîh ê hay jê hebin ku Hackney îsal miqdareke gelekî kêmtir pere ji

Hikûmetê sitend ku karên xanîyên minasib pêk bîne.

Wek encam, bernameya karên malên minasib hatiye guherandin.

Îsal li sîte û blokên ku berê lêkolîneke bi kitkit hatiye kirin û nişstecîhan bi lixwegir re li ser dîzaynê li hev kiriye, kar ê bê kirin. Wekî din, kar ê li dervê blokên seranserî Hackney bê kirin.

Hemû nişstecîhên ku karê wan ê bê kirin, Karmendê Têkildarîya Niîtecîh ê li gel wan têkilî çêbike. Hun kanin bernameya karên plankirî li websîteya Hackney Homes **www.hackneyhomes.org.uk** bibînin an jî biçin Ofîsa Xanî ya taxa xwe.

“Ji 2006an û vir de, Şaredarîya £184 milyon li çêtirkirinên Xanîyên Minasib serf kiriye; pace, metbax, serşokên li bi hezaran xanîyan di nav de ne. Em kêfxweş in ku teklîfa Hackney li Londonê duyemîn fona bilind sitendiye.

“Em ê fon berhevdanê ku me ji Hikûmetê sitendiye ji bo maksîmîze kirina Bernameya Teserûfên Enerjîya Civakî (CESP) bi kar bînin û her weha îsal ji

bo karê Xanîyên Minasib jî £4m razînin."

Endamê Encumanê Philip Glanville, Endamê Kabîneya Xanî, Şaredarîya Hackney

GAVÊN PÊŞÎ ji bo kirîna xwanîyê xwe

Wek kirêdarekî şaredarîyê, GAVÊN PÊŞÎ (FIRST STEPS) kane alîkarîya we bike ku xanîyê xwe bikirin û lingekî bixin ser dirênceka milkan.

Ji bo we gelek bijartek hene; Xwedîtîya Parvekirî, Kirîna Yekem, Kirîna Xanî ya Dîrekt û Xwedîtîya Xanî ji bo kesên bi seqetîyên demdirêj (HOLD).

Ji bo agahîya li ser wateya wan, biçin **www.firststepslondon.org**. Heke hun dixwazin bijartekên ku ji bo we peyde dibin gotûbêj bikin, li gel Xizmeta Xwedîtîya Xanî ya Şaredarîya Hackney li **020 8356 8071** an jî bi email ella.saimbi@hackney.gov.uk têkilî çêkin.

RÛPEL 5

NÛÇEYÊN XWEDÎ-LEASE Û XWEDÎ-MILKAN

We zanîbû ku li Hackney li dor 8.000 xwedî-lease hene?
Ev rûpel ji bo nûçe û agahîya xwedî-lease of xwedî-milkan hatiye veqetandin.

Xwe Nexin Nav Rîska Jahrîbûna Karbon Monoksîdê

We zanîbû ku heke pêwengeke we ya gazê hebe û baş nexebite, ew kane gurîyên karbon monoksîdê bide? Ev pir bi xeter e û kane bibe sedema mirinê.

Ji bo ku ev yek neqewime, tiştê herî girîng ku hun kanin bikin ew e ku hemû pêwengên gazê yên li mala we ji dozdeh mehan carekê bên servîskirin.

Wek xwedî-leasekî şaredarîyê, hun kanin vê yekê bi rêya lixwegirê me Gas Safe Services Ltd bikin, ew vê yekê bi bihayekî taybetî ji bo xwedî-lease'an dikin. Ji bo heta bi mehê £10 (divê kontrateke herî kêm 12 mehan saz bibe) karmendek ê were serdanê û sertîfîkayeke ewlehîyê bide we ku îspat bikin ku pêweng ewle ne.

Hun divê her weha alarmeke karbon monoksîdê jî bikirin û li xênî saz bikin; ew jî bi awayê detekrorên dûmanê dixebitin û heke ji pêwengeke we gaz der

biçe, ew ê hişyarîyekê bide we.

Ji bo bêtir agahîya li ser Gas Safe Service, email bişînin bo **service.charges@hackneyhomes.org.uk** an jî telefon bikin **020 8356 2298**.

Tev li Koma Şêwirdarîya Xwedî-lease'an bibin

Em hîn jî li Hackney li xwedî-lease'an digerin ku tev li Koma Şêwirdarîya Xwedî-lease'an bibin. Ev yek derfetê dide we ku nişteciîhên hevraman bibînin û awayê ku xizmet ji xwedî-lease'an re tên pêşkêşkirin li gel birêvebirên bilind gotûbêj bikin.

Hun kanin hema ji me re bibêjin ku hun ê çi bînin nav komê û tev lê bibin. email bişînin bo **servicecharges@hackneyhomes.org.uk** an jî name binivîsin: Leasehold & Right to Buy Services, 1st Floor Christopher Addison House, 72 Wilton Way, London E8 1BJ.

Bi Dîrekt Debît bidin – hêsan e

Dîrekt Debît awayê herî hêsan û minasib ê dayina bihayên xizmetê yên we ye. Hun kanin her meh (di roja ku hun dixwazin de) bidin û pêwîst nake ku hun bi xwe tiştekî bikin.

Êdî li banke û postexaneyan ketina rêzê, yan jî heke hun ji bo betlanê li dûr bin, nedayin çênabe.

Ji bo qeydkirina dayina bi Dîrekt Debît, hema formê tije bikin û dawîya mayî em ê bikin. Form li websîteya Hackney Homes peyde dibin **www.hackneyhomes.org.uk** an jî telefon bikin **020 8356 2100** û yekê bixwazin.

RÛPEL 6

Ji bo projeyên piçûk heta £2000an fon peyde dibin – nuha serî lê bidin.

Hun li ser projeyeke ku bi kêrî nişteciîhên Woodberry Down Estate tê dixebitin?

Heke erê be, hun kanin heta £2000an bistînin ku projeya xwe ya çêtirkirina civakê piştxurt bikin. Bernameya Grantên (Bexiş) Piçûk a Woodberry Down li gel serîlêdanên komên dilxwazî û yên civakî, bi yên komên nuh ku hîna ava dibin jî kêfxweş dibe. Ji bo bêtir agahîyê, telefon bikin **020 3222 7028/7000** an jî email bişînin daphne.tagoe-borkins@geneisisha.org.uk

60 Sanîya li gel

David White

Birêverbirê Diravî yê Komela Kirêdar û Nişteciîhan (TRA) a Beecholme

Îlhama we çi ye?

Wek dîzaynvanekî grafîkî, min his kir ku ez kanim dîzayn û xuyabûna Beecholme Estate çêtir bikim û bi kêfxweşî min dema xwe da ku sîteyê veguherînin bo cîhekî ku em gişt bi serbilindî lê bijîn.

Bi kêrî çi tê?

Guhertinên piçûk ên dîzaynê û nixumandina bermîlan bi karên hunerî nişteciîh teşwîk kiriye ku bixwazin li sîteyê xwedî derkevin. Veguherîn balkêş e û cudatîyeke mezin a kalîteya jîyana li sîteyê heye.

Temîyên we ji bo kesên din ên ku bixwazin tev lê bibin?

Veqetandina çenek ji dema we kane guhertineke mezin pêk bîne. Tîma pişteyanîya nişteciîh a Hackney Homes gelek alîkarî pêşkêş dike û pir piştevan e.

Ji bo dîtina karê David ê li Beecholme Estate, li Rûpel 11 binêrin.

Lîstikên Olîmpîk û Paralîmpîk, agahîya nûjen

Karnavala Hackney One û gelek pîrozbahîyên din, salek maye

Roja Çarşema 27ê Tîrmehê, London ê bi çalakîyeke mezin li Trafalgar Square Yek Sal Mayina Lîstikên 2012an pîroz bike, lê belê dê gelek derfetên pîrozbahîyê li vir li Hackney jî hebin.

Li Festîvala Hackney Fringe ya di 25ê Tîrmehê de, jîrekên klasa cîhanê yên ji herêmê bibînin, (binêrin **www.createlondon.org**). Biçin Karnîvala Hackney One û Haggerston Park ji bo festîvala çalakîya Park ji bo Jîyanê roja Yekşema 24ê Tîrmehê. Di Tîrmeh 22-24an de, Sînemaya Guhêzbar ê li jorê çem ji Old Ford bo Hackney Wick biçe (**www.floatingcinema.info**).

Bandeva pîrozbahîyên li Hackney yên vê havînê dê Karnîvala Hackney One bi xwe be, roja Yekşema 7ê Tebaxê, li dor nîvroj ji Ridley Road Market bi rê dikeve û heta bi A10 bo Stoke Newington û nav Clissold Park diçe; li wir Park ji bo Jîyanê xêrhatineke taybetî pêşkêş dike, se'et di 14.00an de. Sî Komên Rengîn ên Karnîvalê yê bi muzîk, dans û pêşanan serî bikişînin. Binêrin www.hackney.gov.uk/onecarnival

Komeleke Nuh a Kirêdaran (KKN) li Priestly Close Saz Dibe

Priestly Close statuya xwe ya wek komeleke kirêdar û nişteciîhan pîroz kir (KKN); li sîteyê roja kêfa civakê bi rêk xist. Di roja kêfê de, Civîneke Gelemperî ya Salan hat lidarxistin ku avakirina KKN fermî bike.

Tîma Tevlêbûna Nişteciîhan a Hackney Homes piştevanîya nişteciîhan kir ku KKNê saz bikin. Serokê nuh tayînkirî, Andrea Rawlings wisa digot, "em

dixwazin ji wan û he her kesê ku bûne alîkar ku em heta vir hatine re sipas bikim.”
Heke hun dixwazin komeleke kirêdar û nişstecîhan li sîteya xwe saz bikin, li gel Tîma Tevlêbûna Nişstecîhan a Hackney Homes li **020 8356 7845** an jî bi email getinvolved@hackneyhomes.org.uk têkilî çêkin.

RÛPEL 7

Tarîfe: keka tûfirengî, çoklata sipî û penîr

(Ji bo 6 kesan)
Di 20 deqîqan de amade dibe

Malzeme
• 175g bîskwîtên nên (shortbread)
•
50g nîvişkê bêxwê, nermkirî
•
200g çoklata sipî, helandî
•
300g penîrê krema nerm ê gişt-rûn an nîv-rûn
• 200g fromage frais
•
225g tûfirengî (strawberry), bi perçên gir hûrkirî

Talîmat
1.
Bîskwîtan têxin kîsekî plastîk û bi tîrekê bikutin.
2.
Hûrikên bîskwîtan tev li nîvişkê nermkirî bikin û dînin bin û kêlekên tenekeyekê.
3.
Çûklata sipî bihelînin.
4.
Penîrê krem û fromage frais pev re biçelqinînin, heta ku zelal û tîr bibe.
5.
Tûfirengîyan li gel çoklata sipî ya helandî tev li tevhevîyê bikin û li hev bixin. Keka penîr bi kevçî derxin û bera qutîka bîskwîtan a teneke bidin. Ser wê rast bikin û çar se’etan bihêlin ku sar bibe û xwe bigire.

Hîn jî dem heye ku ji bo çalakîyên herêmî fon bistînin.

Di çend mehên çûyî de me ji nişstecîhan bersivên balkêş sitendin ku ji bo pîrozkirina Firavîna Mezin û Roja Cîranan sponsorî sitendine. Wek encam,

Hackney Homes dixwaze komên nişstecîhan teşwîk bike ku serî li fonê bidin ku çalakîyeke civakî bi rêk bixin.
Ji bo sponsorîyê, pêşanî ji KKN'yên ku berê serî lê nedane re tê dayin.
Çalakî divê di navbera Tîrmeh û Îlon 2001an de pêk werin.
Ji bo bêtir agahîyê, telefon bikin **020 8356 3527/ 2066** an jî email bişînin housingeditor@hackneyhomes.org.uk.

Serî dizîvirin ku wêneyê dîwêr ê li The Mount bibînin.

Ciwanên ji sîteyên li herêma Lea Bridge li sîteya The Mount berhemeke hunerî ya fantastîk dîzayn kiriye. Koma ciwanan a di navbera 12 - 18 salî de, her Pêncşem di navbera 18.00-20.00an de kom dibin. Berhema wan sîte rengîn kiriye û kenekî dixe ser lêvên nişstecîhên herêmê yên ku derbas dibin. Ji bo bêtir agahîyê, têkilî çêkin, Alex: **07723 874 456** Emma: **07984 183 671** an Julia: **07947 246 050.**

RÛPEL 8

Bi malbatê re rojeke derve qezenc bikin.

Roja havînê derket û betlanên xwendegehê nêzîk bûne, çima tev li pêşbirkê nabin, da ku derfeta qezenckirina 4 bilêtan bi dest bixin? Dibe ku hun li Alton Towers, Chessington an London Zoo (bexçê heywanan) jî kêf bikin. **Pirsê bersîv bikin: Daweta Kralîyetê îsal di kîjan rojê de bû?** emailekê bişînin bo housingeditor@hackneyhomes.org.uk an jî bersîvê bi karteke postê bişînin bo Tîma Komunîkasyonan: Communications Team, 1st floor, CAH, 72 Wilton Way London E8 1BJ.

Bimeşin bo xweşîyê

Jînde bibin, li derve kêf bikin û tev li bernameya pev re meşîyana seranserê Hackney a vê havînê bibin. Meşên koman awayekî hêja yê civakîbûnê, hevdîtina mirovên nuh, kêfkirina li parkên herêmê û bijûn bûnê ye; her weha ji bo tevlêbûnê pêwîst nake ku hun pir bi dûr biçin.

Meş ji bo hemû temenan (jî) e; bi taybetî ewên ku nuh dest bi egzersîzê dikin, çi xwe jînde his nakin çi ji 50 salî meztir in.

Biçin **www.hackney.gov.uk/sports-walking-together.htm** an jî têkilî çêkin li gel koordînatorê Pev re Meşîyanê li **07891 498150.**

Nişstecîhê salê, Tony Osborne ji bo xelatên NFA ketiye nav lîsta kurt.

Federasyona Netewî ya xelatên ALMO ku ji bo naskirin û pîrozkirina karê baş û serketinên kirêdarên ALMO hatiye dîzaynkirin, takekes û komên ku di astên jêr de ji bo çêtirkirina jîyanên cîranan û civakên ku di nav de dijîn pir kar dikin, xelat dike.

Tony ji bo alîkarîya veguherîna cilşogeheke bikarnehatî bo navendeke ji bo hemû beşên civakê hatiye naskirin.

Wî her weha dahnên kluba baxçevanîyê bi rêk xistine, da ku li dervê holê malbatên ji sîteyê bigihîne hev ku ji tenêbûna mala xwe derkevin û hevalên nuh çêkin.

Serketî yê di seremonîyeke 12ê Tîrmehê de bên daxuyanîkirin. Serketin bo Tony.

Tony ji bo alîkarîya veguherîna cilşogeheke bikarnehatî bo navendeke civakê hatiye naskirin.

Li ser Kontrola Kûçikan a Hackney gotina xwe bikin.

Ji bo alîkarîya mijûlbûna xwedîtîya bê berpirsî ya kûçikan, Şaredarîyê li ser pêşniyarên bicîhkirina hinek Fermanên Kontrola Kûçikan şêwirdarîyeke gelêrî ya dozdeh hefteyan daye destpêkirin. Fermanên Kontrola Kûçikan desthilatîyê dide Rayedarên Herêmê ku bi acizkirina kûçikan mijûl bibin, wek nehiştina bezandina kûçikan li herêmên veqetandî yên wek sîteyan û li herêmên wek lîstikgehên zarokan nehiştina kûçikan.

Hun kanin formeke şûnve agahîdayinê ji websîteya Şaredarîya Hackney an a Hackney Homes daxînin, an jî telefon bikin bo Bicîhkirina Parastina Hawirdorê li **020 8356 4504** da ku yekê ji we re bişînin.

RÛPEL 9

Bi bîr anîna civaka Qereçî Gerok Roma li Hackney

We zanîbû ku li Hackney civakên Qereçî Gerokan ên ji yên herî navdar ên Londonê hene? Hezîran meha Dîroka Qereçî Roma Gerokan bû û li seranserî Hackney hejmarek çalakî pêk hatin ku bandora ku civakê li navçeyê kiriye pîroz bikin. Dansa Îrlandî, nêçîrên gencîneyan, dahnên çîrokgotina zarokan û şowa modaya popular hebûn.

Bi rêya navbervanîyê çareserkirina nakokîyan

Birêvebirên Sîteyan ên Hackney Homes ê nuha nişstecîhan sewk bike

bo Xizmeteke Navbervanîyê ya nuh ku ji bo çareserkirina nakokîyan alîkarîyê bike.

Xizmet ji alîyê Mediation Company tê pêşkêşkirin; ew ê li gel navbervanekî perwerdebûyî nişteçîhan bibîne û pev re li ser mijaran bipeyivin.

Navbervanî metodeke ceribandî ya alîkarîya çareserkirina mijaran e û her tiştê ku tê gotûbêjkirin nehênî dimîne. Navbervanê perwerdebûyî yê her du alîyan teşwîk bike ku li ser fikaran bipeyivin û rêyekê bibînin ku pev re bixebitin û çareserîyekê bibînin.

Ji bo bêtir agahîyê, li gel ofîsa Taxê ya herêma xwe têkilî çêkin.

Navbervanî metodeke ceribandî ya alîkarîya çareserkirina mijaran e û her tiştê ku tê gotûbêjkirin nehênî dimîne.

Lehengê we yê Hackney Homes kî ye?

Hackney Homes bang li nişteçîhan dike ku karmendên ku bi xebatên xwe hêjayî xelatê ne, bi nav bikin. Nişteçîh kanin sipasdarîya xwe ji bo baxçevan, paqijvan, karkerên tamîrê yan karmendekî din ku cudatîyek pêk anîye dîyar bikin. Ev dibe derfetek ku karmend ji bo dilsozîya xwe ya berbiçav, bûyina modela rolê ji bo hevalên xwe û sitendina şûnve agahîya erênî ji nişteçîhan, bên naskirin. Formên navdayinê yê li ser înternetê bi rêya websîteya Hackney Homes **www.hackneyhomes.org.uk** peyde bibin, an jî piştî 11ê Tîrmehê, formekê ji ofîsa taxê ya herêma xwe bistînin.

Kirêdar pesnê karmendên Hackney Homes dide

Kirêdarekî ku demeke dirêj rûbirûyî şêlên antîsosyal (ŞAS) ên cîranekî dengzar bûbû, piştî bi serketinî çareserkirina pirsgirêkên wan, ku belager ji xênî hat derxistin, sipasîya xwe dîyar dike.

Kirêdarê ku li Bakurê Rojhilatê Hackney rûdine, ji karmendê ŞAS re nivîsî û wisa got, “min derfet nedît ku ji bo hemû alîkarî, piştevanî û şêwirdarîya we ya dema ŞAS ku di van du salên dawî de bi serê me de hat, birêkûpêk sipas bikim – dawîyê di Sibata 2011an de bi dawî bû. Ez bawer dikim ku hun hêja ne, pir dilsoz û di karê xwe de pir jêhatî ne.”

RÛPEL 10

Dengzara cîranan pêşanîya herî bilind e

Hackney Homes ji nêzîk ve li gel Xizmeta Degnzarîyê ya Şaredarîya Hackney xebatê dike ku li dijî nişteçîhên ku bi deng û teqreqa zêde dibin sedema dengzarîyê û aramîya li sîteyan xera dikin, tedbîran bistînin. Xizmeta Dengzarîyê se'etên xwe dirêj kirine, da ku di navbera 20.00 Pêncşem û 2.00 Înî têkilî bi wan re çêbibe; ji 20.00 Înî heta 5.00 Şemî; ji 21.00 Şemî heta 5.00 Yekşem; û ji 18.30 Yekşem heta 2.00 Duşem. Ji bo ku bi tîmê re bipeyivin, telefon bikin **020 8356 4455**

Foruma Kêmendamîyê (Seqetî) çi ye?

Haya wê jê heye ku Forumeke Kêmendamîyê ya Hackney Homes heye?

Ev kom ji kirêdar û xwedî-lease'an pêk tê, ku seqetên ji sîte û taxên cîhêreng ên Hackney in.

Armanca sereke ya Forumê eww e ku li ser çêtirkirina polîtîka û xizmetên ku dibe ku bandorê li nişteçîhên seqet bikin, şêwirdarîyê pêşkêş bike û mijarên ku dibe ku bandora xerab li jîyanên nişteçîhên seqet bikin, balê bikişîne ser.

Forumê li ser van mijaran şûnve agahî daye: polîtîkên tamîr û lênêrînê, piştevanîya nişteçîhên seqet li malên bi baxçeyên xwemal, piştevanîya ji bo rêberîya perwerdekirina karmendan li ser wekhevîyan û gotûbêja ku herî baş çawa li ser performansa sazîyê şûnve agahî bistînin, agahî daye.

Gotûbêjên ku di van civînan de hatin pêkanîn bûne alîkar ku bêtir haydarîya pêwîstîyên nişteçîhên seqet di nav birêvebir, karmend û nişteçîhên din de hebe. Ev destpêka pêvajoyekê ye ku nişteçîhên seqet bi rêzgirtin muamelê bibînin û xizmetên xanî yên kalîte-bilind bi dest bixin.

Ji bo bêtir agahîya li ser Foruma Seqetîyan a Nişteçîhan, hun kanin li gel Mariarosa Frasca li 020 8356 7845 **an jî bi email** getinvolved@hackneyhomes.org.uk têkilî çêkin.

Foruma Seqetîyan vê nêzîkê civîneke salane ya gelemperî li dar xistiye û rêvebirên nuh tayîn kirine. Ev in:

Andrea Rawlings
Serok

Harry Hifi Piper
Cîhgirê Serok

Abiodun Odubawo
Rêvebirê Diravî

Rebecca Freeman

Sekreter

"Ji bo ku bicîh bike ku nişteçîhên seqet bi rêzgirtin muamelê bibînin û xizmetên xanî yên kalîte-bilind bi dest bixin"

Kluba Baxçevanîyê ya Sherrys Wharf serketî ye

Nişteçîhên sîteya Sherrys Wharf dibînin ku karê wan ê xurt berhem dide û pê serbilind dibin. Nişteçîh hatin ba hev ku li sîteyê klubeke baxçevanîyê saz bikin, da ku rehekan biçînin û li ser tilîkesk bûyinê bêtir tiştan hîn bibin.

Nişteçîhên ku baxçevanên Hackney Homes pişteyanîya wan dike, ji bo alîkarîya ku distînin pir sipasdar in. Joyce Brownê ji Sherrys Wharf Estate wisa digot: "Pişteyanîya ku me sitendiye pir bi dilê me ye. Baxçên me mezin in û em bi serketinên xwe kêfxweş in".

Heke hun dixwazin ku baxçeyekî civakê saz bikin, hun kanin li gel Cherie Joseph li **020 8356 1934** têkilî çêkin, an jî email **cherie.joseph@hackneyhomes.org.uk**

RÛPEL 11

Vê havînê tiştên ku bêpere bên kirin

Gelo vê havînê malbatê bibin kuderê? Çima neçin hinek cîhên gerê yên bêpere li Hackney û bêmesref rojekê kêf nekin. Parkên Hackney cîhên hêja ne ku zarokan bibinê, rêzeçalakî seranserî havînê dajo. Wekî din cîhên balkêş: Pirtûkxaneyên Hackney, Muzeya Geoffrey, Muzeya Hackney û Sutton House. Ji bo bêtir agahîyê, biçin **www.hackney.gov.uk**

Baxçevan seranserî salê li sîteyan çaman diçînin.

We zanîbû ku Hackney Homes38 baxçevan hene ku karê wan hêşînkirina bêtirî 300 sîteyên navçeyê ye?

Gelek mirov difikirin ku karê time tenê dema mehên havînî yên germ heye, wê gavê hemû rehek kulîlkan didin; lê belê ev ne rast e.

Tîmê bal li ser kom kiriye ku herêmên hêşîn ên li sîteyan seranserî salê baş li wan bê nêrîn. Payîzî bi hezaran diçînin, zivistanî zexelîyan radikin û havînî latên rehekan saz dikin û daran li sîteyan diçînin.

Karên wan ên rojane ji qutkirina gîhayê, birîna devîyan û lênêrîna gelemperî ya baxçeyên li herêmên hevpar diguherin. Ew her weha ji bo nişteçîhên ku nikanin li baxçeyên xwe hinek karên sivik bikin jî hinek pişteyanî pêşkêş dikin.

Tîm her weha li ser hejmarek sîteyan dixebite, ku dixwazin li sîteyên xwe baxçeyên hevpar saz bikin; ji bo paqijkirina herêmên veqetandi şêwirdarî û alîkarîya fîzîkî pêşkêş dikin. Ew her weha tê zanîn ku diçin xwendegehan ku girîngîya zanîna ku xwarin ji kuderê tê û çawa li malê biçînin hînî xwendekaran bikin.

Ji bo bêtir agahîyê yan jî têkilî bi tîma baxçevanan re, telefon bikin bo Cherie Joseph li **020 8356 1934** an jî email cherie.joseph@hackneyhomes.org.uk

Sofaya derve li Beecholme Estate pêk tê

Sîteya Beecholme li Hackney berhemeke nipînuh a hunerî dîyar kir – sofayeke şeşkursî ya ji dar.

Sofaya siparişkirî ya qeşeng ji alîyê peykervanê navdar, Tim Norris ve ji şirbê (tewrekî çamê) bi dest hatiye çêkirin; nişteçîhên herêmê pê kêfxweş û şa bûn.

David White, nişteçîhê herêmê û Rêvebirê Diravî yê Komela Kirêdar û Nişteçîhan a Beecholme Estate wisa digot, “Kalîteya hawirdora me ya dîtbar yekser bandorê li kalîteya jîyana me jî dike. Karên pratîkî yên hunerî yên wek vî karî bi gelek awayan û gelek caran bi kêrî me tê, hema yek ji wan, ‘xwedîtî’ya sîteyê û lênêrîna nişteçîhan pêşde dixe.

Têkilî bi me re

Gelek awa hene ku hun bi me re têkilî çêkin …
Telefon bikin an jî biçin Ofîsên me yên Taxê:

Bakurê Rojhilat (Stamford Hill)
Clock House, 149 Stamford Hill,
London N16 5LG
Telefon: 020 8356 6500

Ofîsa Nightingale Estate
20 Olympus Square, London E5 8PL
Telefon: 020 8356 1914

Bakurê Rojava (Stoke Newington)
Stoke Newington Municipal Offices, Stoke Newington Church Street,
London N16 0JR
Telefon: 020 8356 6100
Homerton
92 Well Street, London E9 7JA
Telefon: 020 8356 7800

De Beauvoir & Queensbridge
31 De Beauvoir Road, London N1 5SJ
Telefon: 020 8356 6600

Shoreditch
1 Cropley Street, London N1 7PT
Telefon: 020 8356 6705
Whiston Road
2 Whiston Road, London E2 8BW
Telefon: 020 8356 1731

Lêpirsînên xwedî-lease û xwedî-milk
298 Mare Street, London E8 1HE
Telefon: 020 8356 2100
Email:
leaseholders@hackneyhomes.org.uk
service.charges@hackneyhomes.org.uk
major.works@hackneyhomes.org.uk

Tamîrekê rapor bikin
Telefon: 020 8356 3691
Email:
RepairsRCC@hackneyhomes.org.uk
Înternet:
www.hackneyhomes.org.uk/
h-housecall.htm

Pesnê me bidin an jî gilî bikin
Telefon: 020 8356 5022
Fax: 020 8356 5091
Email: housing.complaints@hackneyhomes.org.uk
Înternet: www.hackneyhomes.org.uk/hc-complaints.htm

Tundûtûjîya nav malê yan sûcê nefretê rapor bikin
Telefon: 020 8356 4459 an
Telefona bêpere 0800 056 0905

Hejmarên Telefonên din ên kêrhatî
Raporkirina dengzarîyê: 020 8356 4455
Avêtîyên gir/paqijîya kuçe û kolanan:
020 8356 6688
Vezîvirandin (Recycling): 020 8356 6688
Alîkarîya kirêya xanî û baca şaredarîyê:
020 8356 3807
Lêpirsînên baca şaredarîyê: 020 8356 3154
Paqijîya Sîte û Zemînan
Lênêrîn: 020 8356 1722
Tîma Xanî ya Guhastinê:
020 8356 5765
Ronîkirina kuçe û kolanan: 020 8356 2897
Destûrên parka ereban li kuçe û kolanan:
020 8356 8877
(têkilî li gel ofîsa taxê ji bo destûrên parkkirinê)
Pêweng û Adaptasyon (Lêanîn)
Xizmet: 020 8356 6262
Projeya Serdegirtinê: 020 8356 3333

www.hackneyhomes.org.uk
Hackney Homes Limited. li Îngilistanê Qeydkirî ye, No. 5663757
Ofîsa Qeydkirinê: Christopher Addison House, 72 Wilton Way, London E8 1BJ
Hackney Homes Limited şirîkeyeke ku ji alîyê Navçeya Hackney a Londonê ve tê kontrolkirin
% 100 li kaxeta vezîvirandî hatiye çapkirin